KOVÎD-19

Nimûneya wergirtî ji rêkên bêhnkişandina te nîşan dide ku tu tûşî Vîrûsa Koronaya Nû ya bi navê KOVÎD-19'ê bûyî.

Nîşaneyên KOVÎD-19'ê

Nîşaneyên nasyar Ta, Êşa gewriyê, serêş, Êşa Masûlkeyan, Kuxîn û Astengiya Bêhnkişandinê ne

---

Derman

Heke nîşaneyên nizim ên Vîrûsa KOVÎD-19'ê hebin

Heke rewşa te zêde xedar nebe û hewce nebe ku li nexweşxaneyê werî razandin, tu yê bo mala xwe werî şandin. Destûrkarên ku di bin beşa "Piştî vegeriyana bo malê" da hatine, bişopîne.

Dema ku tu li nexweşxaneyê bî, emê binirxînin ku gelo ceribandinên zêdetir pêwîst dike an na

Dema ku tu li nexweşxaneyê bî, em dikarin dermanên alîkar ên wek Oksîjen û antî-biyotîkan jibo te dabîn bikin.

Di babetên kêmdîtî da renge jibo dermankirinê hewcetî bi amûra Bêhndayînê (ventilator treatment) hebe.

Dema ku tu li nexweşxaneyê bî, tu yê di rewşa dabirrîn û qerentîneyê da bimînî.

Dermankirina we ya asayî

Wekî rêzik, hûn ê dermanên xwe yên rêkûpêk ji berpirsan wergirin.

Eger hûn dermanên taybet dixwin, bi berpirsan re biaxivin.

Piştî vegeriyana bo malê

Heta wê demê ku bi qasî 24 saetan hîç nîşaneyeke nexweşiyê diyar nebe, di mala xwe da mala xwe da bimîne.

Nehêle ku kesên derdora te jî tûpşî vîrûsê bibin.

Bi mebesta ku derdorên xwe tûşî vîrûsê nekî, divê:

- Heya 48 demjimêran piştî kutabûna nîşaneyên we ji pêwendiya bi kesên li mala xwe dûr bin.
- destên xwe baş paqij xwedî bikin – pir caran destên xwe bişon
- Piştrast be ku mala te paqij e

Mala xwe çawan paqij bikin

Her roj bi madeyên asayî yên paqijkirinê destav/serşok, pehtinxane û ode(yên) lê dimînin paqij bikin.

Eger li malê destav û serşoka hevbeş heye piştî bikaranînê paqij bikin.

Hewlî, nivîn û cilên binî bi ava germ a herî kêm 80°C bişon. Cilên din heya ku mimkin e bi ava germ a herî kêm 60°C bişon.

Ji xizm û kesên xwe ra bibêje

Bi kesên ku pê re pêwendiyên we hebûne têkiliyê çêbikin.

Kesên bi we re pêwendiyên nêzîk hebûne divê werin testkirin bi awayê ku hatiye ravekirin di rêbernameya ser malpera www.sst.dk.

Di rojên bê da

Heke rewşa te xerabtir bû, digel bijîşkê xwe an xizmetên Bijîşkiya Awarte da bikeve têkilliyê

Wek mînak, heke singê te diêşe, dîsa taya te heye an heke bêhnkişandina te zêdetir asteng bûye.

Lêzanînên zêdetir

Lêzanînên zêdetir li ser Vîrûsa KOVÎD-19'ê

Rêveberiya Tendurustiyê ya Danîmarkê, berdewam malpera xwe biroj dike (www.sst.dk).

Her wiha tu dikarî bi riya hejmara telefona '7020 0233' digel hêla taybet a bîrûsa koronaya nû bikevî têkiliyê.

Li malpera www.sst.dk lêzanînên têkildarî KOVÎD-19'ê bi çend zimnanan li ber dest in.